

PIRS

Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye.

- Pêşgotin :	2
- Salvegera yekê ya goçkirina Rezoyê Osê	3
- Hejmara 50î ji kovara Pirsê Rêberê silvî	5
- 15ê Gulanê cejna zimanê Kurdî	8
- Em zimanê Kurdî binasin ... Enistûtuya Kurdî ya stenbolê	10
Gotar:	
- Guhertin û pêşveçûn zagona cihanê ya bingehîn e .. Rozad Elî	14
Lêkolîn:	
- Serdem li ber roniya Cizîrî Derwêşê Xalib	18
- Çend têbîn li derbarê vekîtê Rozad	23
- Mîr Xelîl Ramî Bedirxan Konê Reş	27
- Jiyana hunermendê Çiyayê Kurmênc Cemîl Horo Remzî	30
Helbest:	
- Ax û kevirên welatê min ê şewitî Rêberê silvî	39
-Sê birûskê çêrokî û helbestek Dr. Ebdilmecîd Şêxo	41
- Ey welat Merwan Berekat	44
- Diyarî bo kovara Pirs Bavê Serrbest	46
Kelepûr:	
- Ji gotinên bapîran Mistefa Henan	47
- Birûskêk	48

kovarapirs@yahoo.com Buha (50) L.S

Pêşgotin

Ev e hejmara 50ê ji kovara Pirsê ronahiyê dibîne û tîrêjên zimanê Med û Mîtanîyan, Melayê Cezîrî, Ehmedê Xanî, Cegerxwîn û Celadet bi ser gelê Kurd de berdide û bi şêweyên têvel û dilsoz diweşîne.

Bi rastî berdewamiya vê kovarê di nav kurdên Sûriyê de ta roja îro cihê vehesiyê ye, ji ber ku û mixabin piraniya kovarên bi zimanê Kurdî derdiketin rawestîn û hinek jî bi biryaran hatin rawestandî.

Di dirêjahiya van çend salan de, pir astengên curbicur di rêya derçûna kovarê de derdiketin holê wek: Qedexkirina çapa bi zimanê Kurdî û dûrketina pênuşên nivîskarên zimanê Kurdî ji kovaran, ew jî ji ber ku kovara Pirsê demsalî ye, nivîskar jî dixweze bi lez wêne û gotarên xwe di rîya Entirnet re da ku bi şêweyekî fireh li seranserî cîhanê belav bike û zû were naskirin.

Ev hemû asteng digel hinên din jî hikariyên ters li kovarê dikirin, ji ber wê jî carina me du hejmarên kovarê bi hev re derdixistin, carna jî şêweyên çapa hin hejmaran ne ewqas baş bû.

Bi deketina haejmara pêncî ya kovara Pirsê, bi navê desteya rêvebir ya desteya birêvebirina kovarê, em dibêjin ev kovar ya me hemûya ye, bi alîkariya we ev kovara berdewam dibe. Spasî ji hemû nivîskarên ku bi berhemên xwe ev kovara dewlemend kirine.

Di vê boneyê de, em bê dudilî mizgîniyê didin giyanê nivîskarê nemir endamê komîta rêvebir ya kovara mamosteyê nemir Rezoyê Osê ku tucarî em te ji bîr nakin, û qaserî em kanibin emê derxistina kovarê berdewam bikin û wê ranawestînin.

Salvegera yekê ya goçkirina hevalê me Rezoyê Osê

Li boneya salvegera yekê ya goçkirina nivîskar û rewşenbîrê Kurd Rezoyê Osê endamê desteya rêvebirina kovara **Pirsê**, li sibeha roja 04.03.2011, hejmarek ji nivîskar û rewşenbîrên Kurd li gel hinek ji endamên desteya kovarê çûn gundê Dekşûriyê ku 15 km li bareşê Qamişlo ye, û serdana gora wî kirin.



Seredaniyan gurzên gulên li ser navên kovara **Pirsê** û rewşenbîrên Kurd li ser gorê danîn.

Pişt re, beşdaran gotinên xwe kirin, û hinek bîranên xwe bi rehmetî re hewaldan. Li dawiyê birayê rehmetî jî spasiya hemî beşdaran kir û sersaxî ji wan xwast.

Li wê boneyê, desteya kovara “Pirs” ev gotin belav kir:

Dost û hevalên dilsoz...

Belkî ji qedera gelê Kurd e, ku boneyên wî yên herî gewre û rojên wî yên bi êş û şewat jî di mehe Adarê de ne.

Berî niha bi salekê, li çarê meha Adarê, lawê gelê Kurd, mirovê zana û rewşenbîr, birayê me yê hêja Rezoyê Osê govdeyê xwe yê nazik li êşa xwe pêça û bi rêwîngiya xwe ya bêveger de çû.

Mîna ku em dizanin, mamoste Rezo ji destpêka jiyana xwe de di nava pirsên gelê xwe de bû, ew bi hemî rê û şeweyan, çî yên rêzanî û çî yên rewşenbîrî, bi erk

ustubariyên xwe yên neteweyî radibû, wî tevhiya jiyana xwe terxandi bû gelê xwe, û di wî warî de mînak û pêşeng bû.

Kek Rezoyê di jiyana xwe de wek mirovekî ramiyar û rewşenbîr jî, bi comerdî dara mirovatîyê av dida, û xema wî ya mezin çareserkirina pirsên azadî, dadwerî û mafên mirovan bû.

Lê tiştê herî balkêş ew bû, ku zimanê Kurdî li ba mamoste Rezo cihekî zor bilind digirt. Parastin, pêşdebirin û bikaranîna wî xembariya wî ya yekê bû. Gava ziman û çanda zimanê Kurdî dihat meydanê, cihê xwehezî û ezîtiyê li ba kek Rezo nedima û qîretê di dilê wî de hildida. Loma jî çi dema ku ew ji bo kar û çalakiyên zimên û çanda Kurdî dihat agahdarkirin, wî hesabên biçûk binpê dikirin, û bê erêna bi hemî kanînen xwe jê re amade dibû.

Ji ber wê jî, û digel ku kek Rezo bi bêtirî zimanekî biyanî baş dizanî û kanî pê binivîsanda jî, lê biryara bikaranîna zimanê dayîkê li ba wî bêveger bû, û hemî cureyên nivîsarên xwe bi Kurdî dikirin, û herwiha bi dehan

lêkolîn, çêrok û gotaên xwe, bi kurdiya xwe ya zelal nivîsandin.

Xebata wî ya di kovara “PIRS” de jî di çarçewa dilsozî, hezkirin û pêbendiya bi zimanê Kurdî re bû. Bi rastî jî eger ne bi saya xemxarî û dilsoziya kek Rezo û kesên mîna wî bûya, wekî ku çawa gelek kovarên me yên Kurdî li Sûryê rawestîne, niha kovara “Pirs” jî dê rawestiya ba.

Kek Rezo... Ustubariya me ye ku digel hemî asteng û kêmkasiyan, emê şopa te bajon, û bi alikariya dost, heval û rewşenbîrên dilsoz, û li pêş her tiştî jî wek pêbendiyêke sinciyane bi zimanê me yê şêrîn re, emê derhanîna kovara xwe berdewam bikin, û dara ku Rezoyê Osê bi xuya eniya xwe av dida, biparêzin û nehêlin pelên wê biweşin.

Belê hevalino... Erê em niha birayê xwe Rezoyê Osê bi bîr tînin, lê bê guman ew li ba me û li ba tevahiya gelê Kurd nebûye bîranînin û dê nebe jî, ji ber ku mirovên mîna wî namirin, û her dem di hiş û dilê gelê xwe de zindî dimînin.


Desteya rêvebirina kovara PIRS

Hejmara Pêncî

Ji Kovara PIRSê

Rêberê Silvî

Berî 19 salan, roja yekşemê 27.09.1992an, nûnerên kovarên Kurdî "Gelawêj, Stêr û Rê", bi armanca yekirina her sê kovaran, civîneke hevbeş li bajarê Qamişlo li dar xistin û hin biryarên giring standin, ji wan birayaran:



1-Navê kovarê PIRS e.

2-Dê kovareke nû pêre derkeve, navê wê "Nûbuhar".

3-Kovar, demsalî ye.

Di warê pênasîna kovarê de, biryar bi vî awayî hatiye nivîsandin: "Kovara PIRS, kovareke çandeyî, torevanî, zanistî û serbixwe ye, her sê mehan carekê dertê, ango ew demsalî ye."

Di warê destnîşankirina armancên kovarê de jî, weha hatiye nivîsandin:

1-Himbêzkirina berhem û afirandeyên rewşenbîr, torevan, hunermend û nivîskarên Kurd.

2-Danasîna rewşenbîriya Cîhanê.


3-Derîvekirina hevpeyvîna rewşenbîrî bi her awayî, ji bo pêşvebirina rewşenbîriya Kurdî.

4-Berçavxistin û belavkirina her hêlên rewşenbîriyê.

5-Pêşvebirina zimanê Kurdî bi rêya wergerandina rewşenbîrî û toreya gelan.

6-Civandina hêzên rewşenbîrî yên Kurdî.

7-



Vekirina "minbereke" demokratîk ji bo çaresazkirina pirsgerêkên rewşenbîriya Kurdî.

Herweha biryarê maf daye Komîteyê ku ew di civîna xwe de sergotarê bixwîne, biryarê bi rastkirin, guhertin, belavkirin yan ne belavkirina wê bistîne, biryar bi vî rengî hatiye nivîsandin: "Komîte, gotina sernivîskariyê ya her jimarê dixwîne û biryarê li ser distîne,: belavkirin,

guhertin...hwd." Di warê xweseriya kovarê de, biryar bi vî awayî hatiye: "*Komîte dikare bi dengdaneke tevayî endamên xwe kêr bike yan pirtir bike*". Digel gelek biryarên din jî di warên rêkxistin û rêvebirina kar û barên kovarê de.

Di van 19 salên borî de, me çî ji armancên kovara PIRS pêk anîne, kêmasî û cîgehên lawazî û qelsiyê di kûderê de çî ne?. Bi kurtî em dikarin bibêjin, ku ji ber sedemên zext û guvaşa li ser zimên, wêje û çapemeniya Kurdî li Sûriyê bi tevayî, me nikarîbû kovar di dema wê ya pilankirî de bigihanda ber destê xwendevanên wê. Di van 19 salan de, li şûna ku me 74 hejmar ji kovarê derxistana, tenê 50 hejmar çap bûye û hatiye belavkirin. Ango li şûna ku her sê mehan carekê, kovar her çar meh û 13 rojan carekê derçûye, jî bilî ku me hîç nikarîbû kovara biçûkan "**Nûbuhar**" derxista û ew weke hesretekê di dilê me de ma, bi hêvî ne ku di paşerojê de em karibin wê armancê pêk bînin, dilê xwe, zarok û xwendevanên xwe pê xweş û şa bikin.

Ji hêleke din ve, digel rêz û hurmeta giran ji desteya kovarê re, bi sedema dûrketina hin endamên komîtê ji kovarê û derketina hinan derveyî welêt, hin qelsî û xizaniyê di naveroka kovarê de cih girt. Ev e jî rastiyeke divê em lê hay bibin, jixwe ji bo çareseriya wê yekê jî xebat û westaneke mezin, alîkariya nivîskarên Kurd, xemxurên ziman, peyv û çanda Kurdî bi kovarê re pêwist e, nemaze jî piştî ku li 4ê meha Avdara sala 2010an endamê desteya kovara me, rewşenbîr û zanayê hêja **Rezoyê Osê** ji nav me bar kiriye.

Di vê bîranîna pîroz de, em ked û cefaya endamên Kovarê yên berê bi gul û sosinan bibîr tînin û alîkariya nivîskar û rewşenbîrên Kurd bi kovarê re ji bîr nakin û bi dilgermî û rêzê girtin dinirxînin. Ji ber ku zimanparêzî yekek ji hêmanên sereke yên gelhezî û weatparêziyê ye, em bi hêvî ne ku her li ser vê rêyê, rêya berevaniya rewa di ber hebûn, parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî de kar û xebat berdewam be!.

15ê Gulanê

Cejna zimanê kurdî

Di encama şerê cihanê yê yekê de, dewletine nû li Rojhilata navîn hatin damezrandin, û gelê Kurd û welatê wî jî li ser çend dewletan ji wan hatin parvekirin.

Piştî ku heyama siyasî li Rojhilata navîn rawestî, û sînorên navdewletî yên nû hatin çespanandin, ew dewletên ku Kurdistan li ser wan hati bû parvekirin, siyasetên tunekirinê di tenga gelê Kurd re ajotin.

Wan li destpêkê dest avêtin zimanê kurdî, û xwendin ,nivîsandin û dengkirina bi kurdî jî qedexe kirin, û herweha, hebûna zimanê kurdî û gelê Kurd bi xwe jî ketin tirsdariyeke rastîn.

Mixabin, ew helwest û siyasetên li dijî şaristanî û mirovatîyê, ra dema niha û bi şêweyên birêkûpêk tên meşandin, û zimanê kurdî û gelê Kurd jî hîn di rewşên ne azad de ne.

Di ew rewşên kambax û dijwar de, gelê Kurd û lawên wî yên zana û dilsoz, herdem û ta roja îro berxwe didin. Yek ji lehengên herî gewre di warê zanîna zimên û çanda Kurdî de, Mîr Celadet Bedirxan bû.

Mîrê gewre Celadet Bedirxan, li destpêka salên sihî ji sedsala bîstan Abeya kurdî ya latînî danî û kovara HAWARÊ pê weşand. Wî bi ew karê xwe yê pîroz ,soreşeke rastîn di warê zimên û çanda kurdî de rakir.

Hejmara yekê ji kovara Hawarê di roja 15ê meha Gulanê ya sala 1932an de ronî dît. Loma jî , roja derçûna wê di jiyana û vejîna zimanê kurdî de, rojeke pir naskirî û zor pîroz e.

Lê, mîna ku em dizanin, ew soreşa ku Mîr Celadet di warê vejîna zimanê kurdî de dabû destpêkirin, hîn bi dawî nebûye. Ji ber ku hîn tunekirina zimanê kurdî di navika nîşana neyaran de ye, û bi tundî dijîtiya hebûna wê tê kirin.

Loma jî, li sala 2006an, hin rêxistinên netewî û saziyên rewşenbîrî li Bakurê Kurdistanê, roja derçûna kovara Hawarê, ango roja 15ê meha Gulanê, wek "Cejna zimanê kurdî" ragihandin, û ji sala 2009an de, li sê rojan (14-15-16ê Gulanê) çalakiyên taybet di warê vejîna zimanê kurdî de li dar dixin.

Saziya me jî, "Saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li Sûriyê", biryar da, ku piştgiriya wê pêşinyarê bike, rojên (14-15-16ê) ji heyva Gulanê mîna cejna zimanê kurdî bipejrîne, û li gor rewş û derfetan, kar û çalakiyên taybet di ber parastin û geşkirina zimanê me de bike.

Li gor heyam û rewşên tevahî, ku roja îro li Sûriyê hene - mîna qedexekirina hemî çalakiyên Kurdekeriyê jê re navnîşan e - dîsa jî, her mirovek û maleke Kurd, kane di hersê rojên "Cejna zimanê kurdî" de bi gelek karên giring di warê hezkirina zimanê xwe de rabe.

Banga me ji her mirovekî Kurd re, ku em bi hev re zimanê xwe biparêzin, bikaranîna wê bikin erk û li hebûna wê xudî derkevin.

Ji bo pêkanîna cejna zimanê me- wek mînak- em van kar û stubariyan ji her kurdekî re pêşniyar dikin:

- Nameyên piştgirî û pîrozkirinê di riya SMSan re, bi boneya Cejna zimanê kurdî ji hev re bişînin.
- Di hersê rojên cejnê de, biçûk û mezin, jin û mêr, û hemî endamên malên Kurdan -ku zimanekî din jî

di mal de bi kar tînin- tenê bi kurdî baxivin, û bi kar wînin.

- Biçûk û mezin xwe fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bikin, û çîrok û nivîsên kurdî di malan de werin xwendin.
- Têbîn, tiştên xwe yên taybet, nav û nimreyên telefûnan, çi di defteran û çi di mobaylan de, bi kurdî binivîsin.
- Li qenalên tilfizyonên kurdî temaşe bikin.
- Guhdarî stran û mûzîka kurdî bikin.

Em bawer in, ku mirovên me yên bi qîret, kanin bi van çend tiştên biçûk û pir giring rabin, û kanin tiştên ji wan mezintir û giringtir jî ji bona zimanê xwe bikin.

Belê.. Parastina zimanê me erk, dilsozî û stubariyeke netewî ye. Pir giring û gerek e, ku em li zimanê xwe û cejna wê xwedî derkevin, da wê cejnê di jiyana gelê me de, bikin boneyeke jîndar û sûdar.

Cejna zimanê kurdî li her mirovekî Kurd pîroz be.

"Saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li Sûriyê"

S.F.P.Z.Ks

EM ZIMANÊ KURDÎ BINASIN

Amadekar:

Hasan Kaya, Zana Farqînî û Sami Tan

Enstituya Kurdî ya Stenbolê .. www.enstituyakurdi.org

Peyvsazî

Kurdî, zimanekî wisa ye ku ji pêş, paş û navê ve qertafan digire. Ev qertafên çêkirinê jî di nav xwe de dibin du bir. Yek jê ew qertaf in ku tenê bi wan ji lêkeran, lêkerên çêkirî tî bidestxistin. Qertafên din jî, tenê bi wan navdêr û rengdêr tî çêkirin. Her wiha carinan di bastûra (bunyeya) peyvê de guherînek tî pêkanîn û jê navdêr tî peydekirin. Nemaze ev rewş, di raweya lêkera fermanî de çêdibe (ji bo halê negerguhêz ê lêkerê). Nimûne *bi+şewit+e*, /bi/ raweya fermanî, /şewit/ qurmê lêkera fermanî, /e/ jî qertafa kesê duyemîn a yekejimariyê ye.

Em tenê qurmê lêkera fermanî hildidin dest û /i/ya di kêteya duduyan de dikine /a/ û navdêrê bi dest dixin: şewit, şewat /i/ bû /a/ û bi vî awayî şewit bû *şewat*.

Ji bilî vê yekê, ji qurmê lêkera fermanî jî qertafên kirdenavan bi dest tî xistin, nimûne:

Ji lêkera kuştinê *bi-kuj-e*, /bi/ û /e/ bê avêtin dimîne |kuj/, em wê bînin deynin ber peyva /agir/ wê peyveke wiha bê himatê: *agirkuj*.

Em bi berfirehî behs ji qertafan nekin, hema ji bo ku mijar zelal bibe û dabaş bê fêmkirin em dê li ser wan rawestin. Pêş jî bo lêkeran em qertafan bidin.

a) Qertafên lêkerçêker

ber+dan = berdan

der+anîn = deranîn

ra+ kirin = rakirin

ve+xwarin = vexwarin

wer+girtin = wergirtin

da+dan = dadan

hil+kirin = hilkirin

ro+ kirin = rokirin

vê+xistin = vêxistin

tê+koşîn = têkoşîn

Niha jî em çend qertafên ku tên paşiya navdêr û rengdêran û bi wan lêkerên sade tên çêkirin bidin:

andin, isandin, ijandin:

Bi van qertafan li jorê lêkerên gerguhêz tên bidestxistin.

Nimûne:

saz+andin = sazandin nerm+ijandin = nermijandin

rep+isandin = repisandin

în, isîn, ijîn:

Bi van qertafê hanê jî, lêkerên negerguhêz tên çêkirin.

Rep+isîn = repisîn Saz+în = sazîn Nerm+ijîn = Nermijîn

b) Qertafên ji bo daraştina navdêr û rengdêran

Piştî van, îcar em bên ser qertafên ku bi wan navdêr û rengdêr tên çêkirin. Ev navdêr jî dibin du bir; kirdenav (ismî fail) û tiştên nav (ismî meful). Ev qertaf hem tên pêşiya peyvê û hem jî tên paşiya peyvê. Ji bo wan jî em çend nimûneyan bidin: Pêşî parkît (paşgir), di pey re pêrkît (pêşgir) û dawiyê jî em navkîtan (navgiran) bi nimûneyan derpêş bikin.

Bi parkîtan daraştina peyvan:

kar+ker = karker

ber+ek = berek

dar+ik = darik

ser+ok = serok

aş+van = aşvan

rim+baz = rimbaz

guh+ar = guhar

mal+dar = maldar

teng+asî = tengasî

kirîv+ atî = kirîvatî

xwîn+î = xwînî

şer+oyî = şeroyî

yekt+îtî = yekîtî

Bi pêrkîtan daraştina peyvan:

a+şûjin = aşûjin

ber+av = berav

ser+dest = serdest

ne+yar = neyar

tele+bext = telebext

hem+pa = hempa

hev+kar = hevkar

kele+girî = kelegirî

zir+keç = zirkeç

bi+kuj = bikuj

bele+guh = beleguh

gû+sterk = gûstêrk

Bi navkîtan daraştina peyvvan:

ser+an+ser = seranser
şad+û+man = şadûman

dest+e+bira = destebira
rû+bi+rû = rûbirû

Encam

Her ziman xwedî rê û rêzikan e û taybetî û qalibên wî hene. Ligel vê yekê, hin rêzîkên ku ji bo zimanan pişkdar in, jî hene. Ev rêzîkên hevpişk (muşterek), bi giştî di navbera zimanên ku ji heman malbatî ne de, têne dîtin. Ji lew re, pir tiştêkî asayî û siruştî ye ku hin ziman ji hin aliyan ve bişibin hev û hêlên wan ên hevpar hebin.

Digel vî qasî, ji van mijarên ku em li jorê yeko yeko li serê rawestiyar, xuya dibe ku zimanê Kurdî ji gelek aliyan ve hem ji Erebi, hem ji Farisî hem jî, ji Tirkî cuda ye. Bi taybetî em dixwazin balê bikişînin ser cihêtiyên di navbera Kurdî û Tirkî de. Ji ber ku, hin zimanzan, siyasetmedar û kesên ji pîşeyên cuda yên tirk îdia dikin da ku zimanê Kurdî ne tu ziman e û kurd bi eslê xwe jî tirk in. Ji bo ku der barê zimanê Kurdî û Tirkî de hizr û ramanê zelal ji kesê meraqdar re çêbe, em dê bi çend xalên berbiçav cihêtiya van her du zimanan bidin xuyakirin.

Kurdî ji malbata zimanê Îndo-Ewropî, Tirkî ji ya ural-altayî ye.

Kurdî zimanekî tewangbar e, Tirkî zimanekî pêvekî ye.

Kurdî zimanekî zayendî ye, Tirkî ne wisan e.

Di Kurdî de du kom cînavkên kesîn û nîşandanê hene, di Tirkî de ev yek nîn e.

Di Kurdî û Tirkî de awayên çêkirina terkîban dijberî hev in.

Zimanê Kurdî, ji pêş, paş û navê ve qertafan digire, lê di Tirkî de qertaf tenê tên paşîya peyvê.

Di Kurdî de peyv bi du û sê dengdaran jî dest pê dike, lê di Tirkî de peyv tenê bi dengdarekê dest pê dike.

Bi kurtî, rêzimanê Kurdî û yê Tirkî qet naşibe hev, denganiya wan, hevoksaziya wan û peyvsaziya wan gelek dûrî hev in.

Em bèn ser angaştên der barê zarava û devokên zimanê Kurdî de. Çawa ku di zimanên din de jî tê dîtin, di zimanê Kurdî de jî devok û zarava hene.

Ew zarava ev in:

- 1) Kurmancî (kirdaskî)
- 2) Kurmanciya naverast (soranî)
- 3) Kirmanckî (Kirdkî, Dimilî, Zazakî).
- 4) Loranî.

Ji van zaravayan tenê li Tirkiyeyê Kurmancî û kirmanckî hene.

Di zaravayê Kurmancî de sê devokên bingehîn hene: botî, silîvî û mehmedî. Ji van, devoka botî ji bo zimanê nivîskî yê Kurmancî wekî bingeh hatiye pejirandin. Rêziman, vekît û ferheng li gor vê yekê hatine amadekirin.

Du devokên hîmî yên zaravayê kirmanckî hene: dêrsimî û sêwregî.

Zimanê Kurdî ji mêj ve wek zimanê perwerde û hîndekariyê hatiye bikaranîn.

Medreseyên kurdan palpişt û delîlên vê yekê ne. Di van medreseyan de ji bilî Kurdî zimanê Erebi jî hatiye bikaranîn.

Gotina dawî:

Zimanê Kurdî têra xwe heye, ji bo ku kurd bi zimanê xwe karibin perwerde bibin û hîndekariyê pêk bînin, ji hêla zimên ve asteng pir kêmtir in. Ji bo hemû zimanan çî astengên zimanê hebin pir hindik ew ji bo zimanê Kurdî jî hene. Ji bo ku perwerde û hîndekarî bi Kurdî bê kirin astengên herî girîng astengên qanûnî yên Tirkiyeyê ne.

Guhertin û Pêşveçûn zagona jiyanê ya bingehîn e

Rozad Elî

Bi rêveçûna demê re, her tiştek ji heyînên gerdûnê dikeve ber darê guhertinê. Ango guhertin û pêşdeçûn zagon û şoperêyeke(urf, sinet) gerdûnê ye bingehîn e, û hemî pêkhatiyêke jiyanê bi bandora wê guherbar in.

Di pêvajoya tevgera gewre ya guhertinê ku li gerdûnê dibin de, hijinek pêkhatiyên gerdûnê pargal û salixên xwe, çi biçûk û çi mezin, ji dest didin, hinên nû tên afrandin û di nav pêkhatiyên heyînê de cihên xwe digrin.

Guhertinê ku li gerdûnê dibin jî, bi tevahî berepêş û erênî ne, ango xweza û pêkhatiyên wê dest ji tiştine xwe yen ku kevin û ne pêwîst bûne berdidin, û hinine kêrhatî û sûdartir li şûna wan cih digrin.

Wekî ku guhertinê bingehîn û gewre di warên ciyolocî,

çerxufelekî, biyolocî û di hemî warên xwazayê de çê dibin, ew di warên ramyariya mirov, rewşenbîriyê, ol, felsefe, siyaset, derûn...û hwd de jî rastiyeke zanistî û berçav in. Di wan waran de jî gelek tiştên kevinar bêkêr dibin û paşê jî ji holê radibin, û li şûna wan hinên nûjen dafirin. Û ew guhertinê nû bi xwe jî li paşerojê dibin zemîn û ardû ji guhertinê din re. Û herweha tevgera guhertinan ranaweste, û her dem gerdûn xwe diguhêre û xwe davêje pileyên cidawaz û bilindtir.

Li gerdûnê, û di jiyana mirov û civakan de, guhertin bi tevahî, bi dû şeweyan çê dibin:

1- Guhertinê ku bi vîn û îradeya mirov çê dibin. Ango mirov pê radibe û di ber de berpisyar e.

2- Beşek ji guhertinan jî xwezayî ne, ew ji ber xwe ve û

li derveyî vîn û destêwerdana mirov çê bin.

Ji aliyê şêwe û çawaniya guhertinan de jî, guhertin bi du rengên sereke dibin:

1- Guhertinên biçûk: Bi rengê hêdî, nerm, berdewam çê dibin.

2- Guhertinên mezin: Bi piranî bi rêya tevgerên gewre û şoreşane rûdidin.

Dîroka şaristaniya mirov mêlag kiriye, ku rengê guhertinan ê biçûk, ew şoperêya guhertinan a durust û resen e, û bingeha sereke ye ji nûjenkirin û pêşdeçûnan re. Lê dema ku rê li ber şêweya guhertinên biçûk tê girtin, û pirsgirêkên tevahî di demên xwe yên gerek de sererast û çareser nabin û li pêşiya guhertin û xwenûjenkirinê dibin asteng, wê hîngê meydan ji guhertinên mezin re vedibe, û dibin serdar û ew rûdidin. Ango dema ku rê li ber zagona xazwayî ya guhertinan dixetîme û derfetên asayî tî wêrankirin, şêwaza guhertinên mezin (şoreşane) tê meydanê.

Yanê, tê wê wateyê ku şêweya guhertinê ya mezin û şoreşane, di rewşên taybet û di bin nîrên awarte de çê dibin, ango ew bend û aloziyên ku li pêş zagona xwazayî ya guhertinan dibin asteng, bi şêweyên şoreşgerane û mezin tî çareserkirin.

Wek çawa ew zagona xwazayî ya guhertinan di hemî warên şaristaniya mirovatîyê de rastiyeke e û rast e, ew di warên civakî, siyasî, damezrandina dewlet, sazûman û di rêvebirina wan de jî hatine taqekirin û mêlag bûne.

Eger em li dîroka hevdemî vegevin, emê bibînin, li dewletên ku gelan sazûmanên wan afrandine, mirovên wê azad in, kanin bawerî û nêrînên xwe bi serbestî bêjin, daxwaz û pêdviyên xwe nas dikin û kanin bi hêminî bi dest bixin, ango ew guhertinên ku pêwîst û pêdvî pê hene di demên xwe yên minasib de tî kirin, û pirsgirêkên dewlet û civakê jî bi awayên aştiyane û asayî tî çareserkirin, di wan rewşan de pêdvî bi şêweyên guhertinan ên

mezin nîne û şêweya guhertinên biçûk û berdewam serdar dibe.

Wek mînak, li gelek dewletên Rojavaya Ewropayê, ji dehsalan de pêdvî bi guhertinên şoreşane nebûye, çinkî zagonên wan ranawestî û zingar nagirin, sazî û dezgehên wan li saz in û her dem xwe çak û nûjen dikin, mirovên wan azad in, guhertinên ku tî xwastin bi şêweyên hêdî, nerim û bê navberî tî kirin, wê lomê jî rewşên civakên wan dewletan hêmin in, rawestî ne û bi şêweyên sirûştî, asayî û serkeftî pêş de diçin .

Li bervajî wê, dewletên ku sazûmanên wan nûjen nabin, rola millet di rêvebirina wan de nîne û mafên mirovan tî bipêkirin, li wan dewletan jîyan radiweste, dem û dîrok disekine, hemî cureyên zordariyan di rêka zagonên kevneparêz re tî kirin, û gelek caran kiryar û şewazên çepel û li derveyî hemî zagonên mirovantiyê jî rûdidin..., ango dema ku rêkên hêminane,

azadane û demokratik li ber guhertinên ku pêdviya civakan pê hene di demên xwe yê lêhatî de netên girin, wê hîngê jîyana mirov û tevahiya civakê dikevin deraqên kambax, tengijîn holê digre û qeyrana tevahî metirsîdar serî hildide.

Ji bûyerên dîroka şaristaniya mirovatiyê diyar dibe ku di rewşên weha de, û ji bo pêkanîna çaksazî û guhertinên civakî û siyasî, rê li ber guhertinên şoreşane hatine vekirin û hemî çalakiyên gelêrî serî hildane û rewa jî bûne. Li aliyê din, û ji bo ku desthilatdar û kesên wê jî desthilatdariya xwe biparêzin, ew jî zor û zordariya xwe bilind dikin û hemî kiryarên kuştarane û setembar pêk tînin, û bi hemî hêza xwe hewl didin ku derfetên guhertinan beravêtî bikin.

Di ew rewşên tengijîn bi qeyran û mofirkî de, bi tevahî du hêz bi hev re rûbirû dibin, hêza guhêrxwaz ku gel wê dinimûne li alîkî, û hêzên kevneparêz û zordar ku desthilatdar bi xwe ne li aliyê

din. Û li dema ku nakokî û dijberî digihê astên bilind, û baweriya gel jî bi hêza xwe, û bi pêwîstiya guhertinê û destxistina serweriya xwe bilindtir dibe, wê hîngê bûyerên şoreşane yên gewre dest pê dikin, û rê li ber guhertinên pêwîst û mezin ku bi darê zorê hati bûn rawestandî, vedibe.

Bi tevahî em kanin bêjin, nakokiyên ku li gelek welatên Rojhilata Navîn rûdidin, bi tevahî di çarçewa dijberiya di navbera nûjenkirin û kevinhîştinê, pêşdeçûn û lipaşhîştinê, azadî û zordariyê, xizanî û komkirina peran ya bê sînor û wijdan de çê dibin.

Di ew katên qeyranbar, mofirkî û hestewar de, û ji ber ku hemî hêz û kanînen dewletê di destê desthilatdarên zordar de ne, li piraniya caran, kiryarên zor tund û kirêt ji hêla wê de li dijî pêşengên gel û gel

bi xwe tên kirin. Di vî warî de, komkujiyên mezin ku ji hêla desthilatên hin dewletên Rojhilata Navîn de hatin kirin, mînakine nêzîk in û hîn jî birînê wan teze ne .

Em kanin wek encam bêjin, eger ku rewşên qeyranbûyî û nîrên nakokbar û dijberane li kîjan welatî peyda bibin, û kîjan desthilata jî rê li ber guhertinên rastîn û bingehîn bigre, û li destpêkê wek merceki sereke, eger guhertina hiş û ramanên xwe jî nûjen neke, wê hîngê ew desthilatbi destên xwe tova nakokî û dijberiya dîrokî ku di navbera kevnaî û nûjeniyê de heye, ango di navbera sazûmanên kevneparêz û gel de heye, av dide, û zemînê ji tevgerên gelêrî û bûyerên mezin re dûz dike û wê berve peqandinên fereh, piralî û metirsîdar têve dide.

Serdem li ber

Roniya Cezîrî

Derweşê Xalib

(1)

Di vê serdema me de, çend pirsên giring xwe didin pêş, ji wan pirsan awayên ramandinê, pêkve jiyan, yeksanî û pirsên din.

Herwekî ev pirsên han bi giştî bi awayê ramandinê ve girêdayî ne û di encam de nîşana durvên serekî yên şaristaniyê ne û ji ber bîr û baweriyên ayînî beşekî giring in ji awayê ramandinê. Lewra di vê mijarê de pirsên ayînî cihekî serekî digirin.



Lê ev bi xwe jî bi pêvajoya dîrokî ya şaristaniyê di navçeyekî de girêdayî ye. Qonax bi qonax şaristaniyên ku di navçeyeke teng de peyda bûne, li derdora xwe belav bûne, rûberekî berfir girtiye ku gelek millet, tuxm û regez têde jiyane, loma jî ew şaristaniyên fireh bersivên wan ên kuncaw ji van pirsên jorî re hebûn.

Li navçeyê me şaristaniyên pir fireh peydabûn, ji hêlînistiyên bigire û paşê jî misilmanan. Di wan herdu şaristaniyan de pir ziman, millet, ol û ayîn hebûn sûd jê werdigirtin û bi pêş ve dibirin, loma bersivên van pirsan ji hêla rewîştên komelaketî û ji hêla raman û bîrdoziyê ve jî hebûn.

Li navçeyê me jî bersivên erênî û pêşketî, bi dehan zanayên mezin mîna "Ibin Erebi" hebûn, ku rêxweş dikirin ji bo pêkvejiyana civaka serdemên xwe.

Li jêr ezê tenê li ser hin ramanên "Melayê Cezîrî" rawestim, ji ber bîr û baweriyên burhan kirine.

(2)

Wek nimûneyek di vê babetê de, Melayê Cezîrî dibêje⁽¹⁾:

Dilgeşte min ji dêrê, naçim kenîşteyê qet

Mihrabê wê bi min ra, wer da biçîne Laleş

Ji vê firdikê belû ye ku Cezîrî li tişteki digere. Weha dibêje:

(Dilê min di geşt û rêwingiyê de ye, ji cihekê diçe cihekê din. Dilê min ji dêrê maye, kenîšta cihwan jî berê dilê min jê maye û nema ez tucar diçimê, niha jî ez di mihrab û mizgeftan de me. Min armanca xwe li tu cî nedî, de ka emê herin perstgeha êzîdiyan, "Laliş".)

Di vê firdikê de diyar e, ku dêr, kenîşt, mizgeft û laliş perestgehên olên cihê ne. Lê Cezîrî nizane kîjan perestgeh ji ya din dikare wî zûtir bigihîne armanca wî, dilê wî lê rûne. Heger ji mafê Cezîrî be li cihekê li gor dilê xwe bigere helbet ji mafê herkesekê din e jî, ku li olekê bigere dilê wî têxe cih. Bi gotinê din, li gorî Cezerî, tukes nikare bêje ev ol durist e, lê dikare bêje dilê min li vê olê rûdine û ev ol li gor dilê min e.

¹. Dîwana Cezerî, Şîrovekirina Muftî rûpel 293.

Di vê gotarê de sê firdikên Cezîrî hatine, Têgeha min cuda ye ji têgeha Miftî. Di be, ku sedem ev bû : "Miftî, ji hêlekê baweriyê wî bi misilmaniyê xurt bû, ji hêla din li nig wî Cezîrî pir baş bû, weku bêjin ev mirovê baş, tucarî şaş nabe û tişteki dervî mislimanî û sofîtiyê nabêje". An jî ji sedemin din têgeha Cezîrî nixumandibe.

Ev helwestek balkêş e, heger çirûsek ji hişê helbestvan be jî, an kêlîkek be di nav ramanên wî re buhurî bin. Heger di diltengiyekê de hatibe, yan jî pêlek lertzok ji xeyala helbestvan riwê pelê wî xemilandibe.

**

Cezîrî di dîwana xwe de, diyar dike ku ev nerînên wî yên jor li gorî zanîn û hişê mirov in, belgeyên zanistî pêkêşî xwendevanê xwe dike.

Heger em gêlîkekê li ser ferdikek ji yên Cezîrî rawestin, ji me re wê diyar bike ku çawa helwesta Cezîrî hewestek li gor bîr û baweriyên wî ne, çawa bi renekî felsefî burhan û teqez dike⁽²⁾.

Ji sira la mekan wacib tenezil kir di imkanê

Fe eyne el ilmû, eyne el 'eynû we eyne el eynû iz la eyn

Ev firdik ji berî sedsalan e, di serdemekê de bû ku pirsên merov hatine guhertin, ji ber vê jî şîrovekirina wê hinekî dirêj e.

Wek ku diyar e, ev rêzika helbestê bi Kurdî û erebî ye, ji hêla din ve hin zaravin felsefî ji demên borî tê de hene, baştir e, hinekî bêne şîrovekirin û zelal kirin.

Piraniya peyvan erebî ne, û ev jî wate û şîrovekirina firdikê ye:

Sir: nixumandî, raz.

Lamekan: bêcihî, necih

Wacib: pêwist, pêdivî. zaravek ji felsefa Eristotalis dertê ku heyîna Xwedan pêdivî ye, û ya hertiştên din imkan û belko ye.

Tenzil kir: daxist, peyda kir., afirand

Di imkanê : daxist imkanê, bicih anî, şiyane

Fe eyne el 'ilmû, eyne el 'eynû: Kanî zanîn, kanî heyîn bi xwe.

². Dîwana Cezerî, Şîrovekirina Muftî rûpel 443

Fe eyne el-Eyn iz la eyn: ma kanî cih heger bê cihî ye. Bi gotinin din kanî cih heger cih bi xwe tune ye.

Hin karin bipirsin, heger cih tune be, çima zaniyarî tune?.

Ji ber ku çawa em nikarin bi gramana dûriya du bajaran bipîvin û çawa em nikarin giraniya kevirekî bi gêlîk û xulên demê bipîvin, wisa ji cihekî em tûtiştî di necih de nikarin bipîvin. Ji heyînê em nikarin neyînê bipîvin. Heger em bipirsin kîjan giran e, kevirekî tune yan stêrek tune, bêguman herdu wek hev in, herdu tenê tunene.

Bi gotinin din, ji ber ku cih mercê serekî ye ji hebûna taqîkirin û tecribekirinê re, her wisa dem jî mercekî pêdivî ye. Bê wan û dervî wan tu nasîn nikare peyda bibe û hiş nikare sawêra heyînekê dervî cih bike.

Wisa em digihêjin wê, ku cih di vê firdikê de venîşana taqîkirin û pîvanê ye, nasîn û zaniyariyê ye, venîşana hişmendî û rewanbêjîyê ye.

Wateya firdikê wisa dibe⁽³⁾:

Bi wê raza, ku Xwedan bi hêz û karîna xwe erd, ezaman, tevaya gerdûnê ji cem xwe afirandiye, ku ne li cihekî bûn, ji bêcihiyê daxistiye û bi cih kiriye.

Naxwe tu zanîn û zanistî nikare bigihêje heyîna Xwedan ku di wê bêcihiya xwe de ye. Ê tu hiş an zanîn nikarin tûtiştî li ser Xwedan binasin, û tu tecrûbeyên serkeftî li ser tayebetmendiyên wî çê tuçar nikarin peyda bibin.

³. Firdika Cezîrî dikare, di hundur felsefa Eristotalis de bê şîrovekirin û encamên Eristotalis gihiştîyê şaş in, û dikare ji bilî tiştê me gotiye bibe rexne li bingehek ji yê felsefa Eristotalis bi xwe.

Bi gotinin din: Xwedan dûrî taqîkirin û tecrûbê ye. Tu nasîn û zanîn wî nas nake û tenê em dikarin bêjin Xwedan heye ji ber pêdiviya heyîna gerdûnê ye (wacib e, wek Eristotalis dibêje).

**

Feqeyê Teyran di dîwaneke xwe de Serpêhatiya Şêx Senan tîne zimên, ku çû Ermenistanê û li wê derê dilket keçek Eermenî û ji bo evîndara xwe mey vexwar.

Di firdikekê de Cezîrî li ser vê serpêhatiyê wisa dibêje⁽⁴⁾

Mey nenoşî Şêxê Senanî xelet

Ew neçû nêv Ermenistanî xelet.

Wetaya wê :

Gotina ku dibêje: "Şêxê Senanî mey venexwar, ev gotin şaş e".

Û gotina dibêje: "Şêxê Senan neçûye Ermenistanê ev gotin şaş e".

Di vê firdikê de li ser Şêxê Senan radiweste. Li gorî Feqê Teyran, vî şêxî keçek Ermenî ya kristiyanî evand, ji bo wê, Şêx ji riya hecê vejeriya, mey vexwar, bû şivanê berazan û dawî bê ku tobê bike, dimire û tevî van karan tevan Şêx cinetî ye, diçe cinetê.

Hinan digotin ku şêx mey venexwariye, hîn bêtir digotin ku neçûye Ermenistanê bi behana ev kar ne li gorî şêxekî weha baş in, Cezîrî li gorî têgehiştin û baweriyên xwe, piştgiriya feqeyê Teyran dike, û kiryarên şêx teqez dike⁽⁵⁾.

⁴. Dîwana Cezîrî Şîrovekirina Muftî rûpel 327

⁵. Muftî bi rengêkî din şîrovedike, lê tu guhertinên bingehîn nikare têkeve mijara me.

Çend têtîn li derbarê vekîtê

Rozad

Di hin gotar û nivîsarên ku digihên desteya birêvebir a kovara Pirsê de, em pêrgî hin têtînan di warê vekîtê de tîn. Wê hîngê em neçar dibin, li gor têtîhîştina xwe ji rêzimana Mîr Celadet Bedirxan re, wan biguhêrin û (sererast) bikin, lê gelek caran jî çawa di nivîsaran de hatine dihêlin.

Hêja ye em bêjin, ku ew têtîn û şeweyên rênvîsê ya (gumanbar) netenê li ba nivîskarên kovara me tîn dîtîn, ew li ba gelek nivîskarên din jî tîn dîtîn, ango ew têtîn pîrsgirêkeke giştî ye, û belkî hemî nivîskarên zimanê Kurdî toşî wê aloziyê dibin û li ber disekin.

Emê di vê gotarê de çend têtînan li ser hin nivîsên ku ji vê hejmara kovarê re hati bûn berçav bikin, û çawahî û bingeha rêzmanî yên ku me ew vekîta wan bêjeyan pê sererast kirine, bidin zanîn.

L berî ku em têkevin mijara xwe, emê du stûnên sereke yên stûnê rêzimana Kurdî Mîr Celadet Bedirxan li derbarê rêzimên û vekîta zimanê Kurdî danîne bi bîr wînin, ew jî ev in:

1. Cudabûn: Ew dibêje, gerek pergala û kesayetiya her bêjeyekê were parastin û ji hev cuda werin nivîsandin. Jibilî ku çiqas tîpên bêjeyekê hindik bin, ewqas bi hêsanî tê bilêvkirin, wêneya wê cihê xwe di nêrîn û hişê mirov de digre û zû tê lezberkirin.
2. Kurtkitin: Kurtkirin, bi tevahî, yan bi guhertina tîpekê bi yek din çê dibe, yan jî du bêje têtîl hev dibin û bêjeke nû çê dibe. Bi derbasbûna hezar salan re, zimanê me rê daye kurtkirinê, loma jî di rênvîs û vekîtê de her ku gengazî hebe, bêje tê kurtkirin û bi rengê xwe yê kurtkirî tê nivîsandin û bilêvkirin. Lê merc ew e, ku wateya wê bêjeyê netê guhertin, û pergala û darêja bêjeyan ji

çarçewa şêweyên ku berê di zimên de hatine bikaranîn û çespandin dernekevin. Wek mînak, wekî ku carina tê kirin, em şêweyên bilêvkirina devkî û herêmkî û kurtkirî yên bêjeyan di nivîsandinê de bi kar neyînin, ji ber ku wê hîngê em ji warê "kurtkirinê" derdikevin û derbas warê nivîsandina zimanê devkî yê bê rêzik û rêziman dibin.

Nimûne yek:

Ev şêwe nivîsandin di du nivîsaran de hati bû:

((Derdê minî giran)).

Di vê hevokê de nivîskar dixwaze wiha bêje: ((Derdê min derdê giran)), lê mîna em dizanin, ji bo ku bêjeya "derd" ducarkî di hevokê de netê û dubare nebe, cinava kesîn ya bi veqetandekê re bûye yek, ango "cinava qersene" ya navdêra nêrza "yê", li şûna bêjeya "derd" a duyem tê û wê dinimîne. Mîna em dizanin jî, ew cinava qersene serbixwe û cuda tê nivîsandin, ango hevok wiha dibe: ((Derdê min yê giran)), û ji ber ku bêjeya berî wê "min"

bi tîpeke dangdar kuta dibe, pêdvî bi tîpa "y" namîne û cinava qersene mîna "ê" dimîne. Û herwiha gerek e hevoka jorîn wiha bê nivîsandin: ((derdê min ê giran)).

Di vê babetê em dixwazin diyar bikin, ku eger bêjeya "derd" di rewşa nebîna de hati ba, ango "derdek" ba, wê çaxê ew cinavê qersene dê mîna "yî-î" û dîsa cuda bihata danîn.

Nimûne didu:

Darêja ((herdû)). Herdû di nivîsekê de bi wateya "didu, du tişt, du mirov ku bi hev re ne, daye nasandin.." hatiye bikaranîn, û bi wê vekîtê ango ((herdû)) hatiye nivîsandin.

Li destpêkê, bêjeya "dû" wateya hejmar "2" nade, eger ew ango "dû" serbixwe were nivîsandin, ew wateya tiştêkî ku "li paş li dû tiştetî" hatiye dide, ango ew "cih û lûsê" dide xuyakirin. Lê ji ber ku di wê nivîsarê "dû" bi mebesta xuyakirina hejmar "2" hatiye, gerek e ew mîna "du" bihata nivîsandin.

Têbîna din, ma çê dibe em "du" û "her" bi hev xînin û mîna yek bêjeyê binivîsin? Di baweriya me de na! Ji ber ku eger me rê da wê, û ew mîna yek bêje nivîsand, gerek em rê bidin hejmarên din jî da ku li ser wê rêzikê herin, û wan jî wiha binivîsin: "herheşt, herbîst, hersed...". Wek em dizanin, ev şêweyên han di nivîsandina zimanê me de netê dîtin û cihê xwe negirtine, û me nedîtiye nivîskarekî di nivîsîna hejmaran de têkilhevî pêk aniye û wiha nivîsiye: Herheft yan herdeh yan herhezhar û hwd. Hejmar herdem cuda û serbixwe tînin nivîsandin.

Yanê, wek em dibînin gerek e, darêja ((herdû)) wiha were nivîsandin ((her du)).

Nimûne sisê:

Di hin nivîsaran de ev darêjna jî bi kar hatine: ((Têde, têre, jêde, jêre, pêre, pêve...û hwd)).

Mîna ku em dizanin, ew darêj ji du beşan pêk tînin: "tê, rê, pê" cinavê lihevxiştîne ne. Û ji pirtikên: "de, re, ve", ew jî

paşdaçek in. Cinavên lihevxiştî jî di zimanê Kurdî de ev in: "pê, tê, jê, lê". Cinavên lihevxiştî ji têkelhevîna cinavên kesî yê tewandî: "ewî (wî), ewê (wê), ewan (wan), û daçekên rasteqîn: "bi, di, ji, li" peyda dibin.

Bi gelemperî, paşdaçekên "de, re, ve" jî li dû daçekên "bi, di, ji" tînin. Ew paşdaçek jî li paş navdêrên ku daçeka rasteqîn wan ditewînin tînin nivîsandin:

wek nimûne: *Ez di makîne de me.*

Lê gava ku em naxwazin navê "makîne" bêjin, em cinava mêza "wê" li şûnê bi kar tînin û wiha dibêjin:

ez di wê de me.

Lê belê bi demê daçek (*di*) û cinav (*wê*) têkilhev bûne, û ev darêj jê peyda bûye: *Ez tê de me.* Ta vir ti pirsgirêk tunene.

Lê gava em paşdaçekê jî li gel "cinavê û daçeka rasteqîn" têkelhevî dikin û bi wan re mîna yek bêjeyê dinivîsin, mîna nimûneyên ku me li jor anîne: ((*Têde, têre, jêde, jêre, pêre,*

pêve...û hwd)), wê hîngê pîrsgirêkeke rêzmanî û vekîtê peyda dibe.

Di vê mijara rêzmênî de, di ti jêderên rêzmanî de nehatiye, ku gengaz heye paşdaçêke jî dikane têkelî "cinava lihevxiştî" bibe û mîna yek bêjeyê werin nivîsandin.

Ji bilî ku rêzmana Mîr Celadet jî li derbarê vê mijarê zelal gotiye, ku cinavên lihevxiştî û paşdeçêk têkelî hev nabin û ji hev cihê tèn nivîsandine, angû: "tê de, pê re, jê re.. hwd".

Ji bilî ku, li gor her du stûnên bîngêhîn ên ku me li jor bi bîr anîne jî, gerek e, **yek**: têkilheviya "wê +di", bipejrînin. **Didu**: Pergal û kesayetiya paşdeçêkê biparêzin û cida û bi tenê binivîsin.

Nimûne çar:

Ew hevok di nivîsarekê de hati bû: "*..ew mijarê rave dikê û dibêjê*".

DU lêker di vê hevokê de hene: "dikê, dibêjê". Ew her du

lêker jî têper in, û di dema "nihoya pêşkerî" de hatine.

Mîna ku em dizanin, kesandina lêkerên têper di raweya "nihoya pêşkerî" de li gor vê rêzikê tê kesandin: (*(berlêker "di"+ raya lêkerê+ nişandeka kesan)*). Nîşandekên kesan jî ev in:

- im: ji kesê peyvok re.
- î: ji kesê gudar e.
- e: Ji kesê nediyar e.
- in: ji gelemariya her sê kesan re.

Wek xuya dibe, nîşandekêke kesan bi rengê (ê) di nav wan de tineye. Loma jî bikaranîna parkîta (ê) wek nîşandekê kesê sisyan (nediyar) di zimanê me de nehatiye dîtin. Ji ber wê jî, bikaranîna wê wek nîşandekêke kesan "kesê sisiyan" li derveyî rêzikên rêzmana zarê Kurmancî ye, û gerek e netê bikaranîn. Angû, gerek e ew hevoka jorîn wiha were nivîsandin: "*..ew mijarê rave dike û dibêje*".

Mîr Xelîl Ramî Bedirxan (1862 – 1932)

Dijberekî hişk bû ji Kemalîyan re û
piştgirekî gerim bû ji şoreşa Kurdî re

Konê Res

Bedirxanî mîna dara çinarê ne, têr şax û pax in, temen dirêj û erdgirtî ne, kevin û dêrîn in, xemla Kurd û Kurdistanê ne. Eger dara çinarê xeml û rewşa çiyayên Kurdistanê be, bêguman malbata Bedirxaniyan di qunaxên têvel de, nav û dengê milletê Kurd bûn. Tev xebat û bizavên wan, bervedêrî bû di ber mafê gelê Kurd de, ta ku ji warê xwe (Cizîra Botan) derbider bûn û di çar kenarên dinyayê de belav bûn..

Mebesta min ji van gotinan ku ez neferekî din ji vê malbata dêrîn û pîroz bi hezkirên zimanê Kurdî û Kurdperweran bidim naskirin.

Ev nefer jî kurê herî biçûk yê mîr Bedirxanê Azîzî ye, navê wî mîr Xelîl Ramî Bedirxan e.



Mîr Xelîl Ramî
Bedirxan

Xelîl Ramî beg yek ji kurên mîr Bedirxan yên paşî bû. Li gor ku di Hawarê de behsa wî hatiye kirin û miheqeq yê ku behis kiriye mîr Celadet e. Xelîl Ramî beg di sala 1862 an de li Şamê çêbûye, anku berî mirina bavê xwe mîr

Bedirxan bi çar an pênc salan çêbûye. Xwendina xwe li Stenbolê, di medreseya sivîl de bi dawî anîye.. Ji ciwaniya xwe ve dîlê Kurdistanê û palayê serxwebûna welatê xwe bû.



Mîr Xelîl di nivî de li ser daniştekê, mîr Celadet Bedirxan li paş wî

Di sala 1887 an de di gel biraziyê xwe Ebdurezaq beg, yê ku bi temen jê mezintir bû, derbasî Kurdistana Îranê bûye, ji wir derbasî herêma Colemêrgê bûye û li wir ji rex zilamên Sultan Ebduhemîd ve hatiye girtin û zindan kirin...

limuteserifê wê.. Her wiha di eynî salê de, ji bo daxwazên gelê Kurd û çareseriyê kêşeya kurdî, berî ku peymanê Sîverê bê mohir kirin, digel du biraziyên xwe (Mîr

Celadet û Kamîran Bedirxan), bi Major Noel yê Înglîzî, Ekremê Cemîl Paşa, Hac Tewfîq (Pîremerd) re, li Kurdistana bakur geriya ye.. Hem jî di wê salê de, di rojên girêdana kongerê Arzeromê de Xelîl Ramî Bedirxan ji rex serok wezîrê Stenbolê ve hatiye teklîfkirin ku Mustefa kemal bigire, lê pêre naçûye serî.. Serleşkerê Melatyayê li dij wî derketiye û di encam de 17 rojan hatiye girtin û paşê ew sirgûnê Beyrûtê kirine. Û wiha Kemalîyan

mehiya wî sekinandine û ew ji milk û malên bavê wî bêpar kirine.

Piştî ku Mustefa Kemal di sala 1923 an de derbasî Stenbolê bûye, fermana bidarvekirina Xelîl Ramî Bedirxan jî di nav lîsteya 150 kesên ku li wan hatibû xezebê deraniye.. Hingê Xelîl Ramî Bedirxan ji neçarî bûye yek ji daniştîyên Sûriyê û Libnanê.

Di sala 1927an de Xelîl Ramî Bedirxan bi biraziyê xwe Celadet Bedirxan û Kurdperweran re Komela Xoybûn li Beyrûtê damezirandine û bûye yek ji endamên komela Xoybûnê û wiha bi Kurdperweran re bizav û xebat di ber welatê xwe de kiriye. Rojên xwe yê dawî di navbera Şam û Beyrûtê de derbas kirine.

Ta ku di roja 13ê heyva çêriya paşî, sala 1932 an de li Beyrûtê çûye berdilovaniya Xwedê. Ê li Beyrûtê, ew di rex birayê wî Xalid Beg Bedirxan de hatiye veşartin. Çendî divîbû ku, li Şamê

di rex gora bavê xwe mîr Bedirxan de bê veşartin..

Di belgeyên ewlekariya hikumeta fransî de hatiye ku, Xelîl Ramî beg Bedirxan dijberê hişk e ji Kemalîyan re û piştgirekî germ e ji şoreşa Kurdî re.. Ê ew belge berdewam dike u dibêje, ku bi jin e û du kurên wî hene, hem jî ku ew birayê Zibêr Beg e yê ku ji nişteciyên Şamê ye.. Dostaniya wî bi Damada Ehmed Namî, serokê Sûriyê re heye.. Dostaniya wan jî rojên Stenbolê ve ye..

Rehmetî ji bilî zimanê xwe bi van zimanan jî zanîbû; Tirkî, Erebî û Farisî. Rehmeta Xwedê lê û li malbata wî be, Xwedê gunehê wî efû bike û cihê wî bihişt be.

Cavkanî:

1 - Ji belgeyên fermandarê tabûra ewlkariya hikumeta Fransî li Sûriyê, di çêriya paşî sala 1927an de.

2 – Ji kovara HAWARê hejmara 11an, sala 1932an, gotara bi navê: Xelîl Ramî Bedirxan.

Qamişlo, 11.01.2011

Jîyana Hunermendê Çiyayê Kurmênc

Cemîl Horo

Remzî

Huner beşek e ji jiyana mirovan, jiyana mirovan bê huner wek Bihara bê xeml û bê xunav e. Belê.. huner xunava can û hêvanê hastên mirov e.

Cemîl Horo yek ji hunermendên, ku bi deng û stranên xwe hevalê hestên her mirovekî Kurd bû.

Helbet jiyana Cemîl Horo wek jîyana her mirovekî bû, lê wî pir ji gel û miletê xwe hez dikir, ne tenê weha, wî gelek ji mirovatîyê jî hez dikir. Mixabin piraniya Kurdan tiştê li ser jiyana û hunera wî nizanin.

Em dixwazin çend mûman li ser jiyana hunermendê nemir û hêja Cemîl Horo vêxînin û ronahiyekê bidin jiyana, kar û xebata wî ya hunerî. Ez hêvîdar im, ku kanibim di asta zengîniya hunera wî de vê lêkolînê ji xwendevanan re diyar bikim.

Hunera hunermendê hêja Cemîl Horo mûma ronahiyê bû, wî bi hunera xwe aliyek ji jiyana miletê Kurd têr dikir, û pir qozîkên tarî ronahî dikirin.

Ji ber ku min kurtejiyênêk bi wî re borandîye, ez dixwazim hinekî li ser jiyana wî rawestim, lê eger min nikanîba mafê wî wek hebû bida, hûnê li min biborînin.

Wek nas e, di dîroka miletê Kurd de gelek nav hene, wan di dema xwe de karên pir hêja kirine, lê piştî ew çûne ser dilovaniya Xwedê hema hema ew ji bîr bûne, lê Hunermendê Kurmancan Cemîl Horo wek dareke mezin e, wî tamarên xwe kûr di jiyana hunera Kurdî de beradane, ew di hunerê de wek ava jiyana bû, wî ji kaniyên Kurdewariyê vedixwar, berê hunera wî ji êş, derd û nalînên Kurdan bûn, ji hêviyên evîndaran bûn. Belê dara huneriya Cemîl Horo pir bilind e.

Ez dixwazim hinikî li bin wê darê rawestim û çend misatn ji ava kaniyên hunera wî vexim, belkî tîna dilê we û xwe kanibim bişkînim, lê ez bawer im eger bi hezaran ji wê kaniyê vexwin, ew ziwa nabe ... ew kê mabe her ewê biherike û av dê wek xwe bimîne.

Cemîl Horo di despêka sala / 1932 / an de li gundê Sarîncekê hatiye dunyê, lê wî zaroktiya xwa li gundê Çolaqa derbaz kiriye.

Cemîl Horo di zaroktiya xwe de li cem xoce û milan xwendiyê, dema ku wî Quran û mewlûd dixwend hevalên wî bi wî re digotin dengê te pir xweş e, dema ku dawet li gundê wî, yan jî li gundên derdora gundê wî çê dibûn bane wî dikirin, ji bo stranên sivik bistrê, berî ku here dawetan wî destûr ji şêxê xwe Heyder bavê şêx Re'bo distand.

Roj bi roj Cemîl Horo ji dengbêjî û stranan ve nêzîk dibû, wek çawa ji huneriyê ve nêzîk dibû, ewqas jî ji şêxîtiyê dûr diket.

Dengbêjiya Cemîl Horo bi stranên filiklorî û gelêrî dest pê kir.

Belkî her kesek kanibe stranan lezber bike, lê ne her kesek kane stranan bêje, û ne her kesê ku stranan dibêje kane gotinan li hev wîne bê ku dûzana sêz bişkîne. Nas e ku Cemîl Horo pir caran ji stranê derdiket û gotin ji dervî stranê li hev tanîn, lê wî tucarî saz û awaza wê stranê ya resen nedîşkand, belê ev taybendmendiya di Cemîl Horo de hebû, ev jî taybetmendiyeke pir bilind e ji aliyê hunerî ve. Bêguman eger bingehê helbestvaniyê di stranvan de tunebe ew nikane bibe xudiyê wê taybetmendiye.

Ez yek ji ew kesên ku ji Cemîl Horo ve nêzîk bûm, min ew baş nas dikir, ew ne tenê hunermendê Çiyayê Kurmênc bû, ew ne tenê stranbêj bû, lê belê ew xudî bingehê helbestvaniyê bû jî, gelek helbestên wî hene û bi dehan helbestên xwe ji şagirtên xwe re dixwendin.

Di vê lêkolînê de gelek stranên ku ji gotin, saz û awazên wî emê bidin xuyankirin.

Cemîl Horo û parastina stranên Kurdî :

Hin ji taybetmendiyan Cemîl Horo yê hunerî, wî di destpêka

jiyana xwe ya hunerî de girûpk ji stranbêj û tembûrvanan gîhandin hev, ji bo tumarkirina sêlikan û bi taybet stranên kevnar, wek : (Eysa Îbê, Êsibê şer, Teyar Beg, Delal ; Memê Alan ...) Ê.T. D.

Piraniya wan sêlkan li Helebê li mala Sibahî Kamil tumar dikirin. Yanê mirov kane bêje, hunermendê Çiyayê Kurmênc Cemîl Horo di dema xwe de karekî pir hêja dikir, wî kiltûr û pêma Kurdî ji wendabûnê diparast. Ji ewên ku di wê girovê de kar dikirin ev bûn :

- Tembûrvan : Mihemed Elî Tico, Eliyê Kapê û Adîk.

- Zurnevan , bilorvan, û pîkvan ev bûn : (Etûn, Selman û Henanê Nêsir).

- Yê ku li şîşvan û kevçiyar dixist navê wî (Çamo) bû.

Elîyê Kapê digot : / 72 / strana Kurmancî hene, ez kanim wan hemûyan bêjim.

Adîk yan (Azî Tembûr) ew tembûrvanê yekemîn bû di herêma Efrînê de, û tukes wek wî nehatiye, mxabin kesê diçe nema vedigere.

Bêguman dema mirov li ev karê hêja, yê ku Cemîl Horo di

dema xwe de kiriye radiweste, baş nas dike, ku ta kîjan astê Cemîl Horo xwedî hestekî netewî û bilind bû.

Rast e Cemîl Horo li ti alvên muzîkê nedixisit, lê wî bi dengê xwe karîbû hemû meqamên Kurdî rast û durust bikirana, wî li gorî meqêman kanî bi dengê xwe jî bilîsta bê ku meqaman bişkîne.

Dengê Cemîl Horo

Ji aliyê deng ve, Cemîl Horo xwedî dengê çiyayî û bilind bû, dengê wî pir xweş û zelal bû. Di dema wî de dengê wî di herêma Efrînê de yekemîn deng bû, belê dema wî distra gelî û newalan dengê wî dilorandin, ta roja îro jî ti deng wek dengê Cemîl Horo di herêma Efrînê de nehatine.

Belê dengê Cemîl Horo dengê ciyawaz bû, û gelek taybetmendiyên dengbêjiyê di dengê wî de hebûn, wek : Kalandina deng, û kalandin jî di strandina Kurdî pir tişteki girîng û nerxdar e.

Ya din Kurdîti di dengê wî de heye, yanê dengê wî pir baş li meqamên Kurdî siwar dibe, û bi taybetî di meqama beyat de.

Eger îro roj mirov bixweze li dengê wî wek dengê hunermend

Cemîl Horo bigere, û bi taybet li herêma Efrînê ew deng nayê dîtin.

Cemîl Horo.. Meqam, awaz û gotin :

Hunermend Cemîl Horo gelek meqam strane, û dengê wî dengê hemû meqaman e, lê wî jî wek hemû dengbêjên Kurmancan bêtir meqama beyat bikaraniye.

Yek ji sedemên ku piraniya dengbêjên Kurdan meqama beyat bikartînin ew e, ku meqama beyat di binyada xwe de meqameke Kurdî ye, ev meqam li ser navê hoza Beyatî ya ku li Kurdistana başûr belav dibe hatiye binavkirin.

Li rex meqama beyat Cemîl Horo di stranên xwe de meqamên rist û hîcaz jî pir bikaranîne.

Ji ber ku min li bajarê Helebê enistûtiyê mozîkê xwendiyê, û min pir ji mozîkê hez dikir, ev ji aliyekî ve, û ji aliyê din ve jî min pir ji dengê hunermend Cemîl Horo hez dikir, ew bûn sedem ku ez di ciwaniya xwe de bi Cemîl Horo re têkildar bim, û di wê têkildariyê de min piraniya karên wî yên hunerî nas kirin.

Piraniya stiranên Cemîl Horo ji gotin û awazên wî bûn, ji ber wê jî wî zanibû çî dibêje, û ji her straneke wî re armancek hebû, ji ber wê jî dema mirov li stranên wî guhdar dike badora wa stranan li dil û hestên wî dike. Stranzanist dibêjin, dema ku di strananê de gotin, awaz û deng hev temam bikin, ew bandora xwe li hemû giyaneweran dike, ez bawer im ev tişt di stranên Cemîl Horo de balkêş e.

Kesên ku stranên Cemîl Horo şopandine baş dinasin, ku hestê netewî cihê xwe di wan de bilind girtiye, û li rex stranên wî yên netewî û Kurdewerî stranên evînî û civakî jî cihekî fireh wergirtine. Evîn li cem hunermendê me tiştêkî pîroz bû, wî evîn sermiyanekê pir bi nêrx didît, wî di straneka xwe de weha gotiye :

Bila dil bi dil be..zengînê ne ti tiş e

Wî digot :

Evîn her tiştêkî geş dike

Dilê bê evîn dareke hişk e

Dara hişk bê ber e

Dara bê ber be bibil li wê nacivin.

Hunermendê Çiyayê Kurnênc gelek mereq, kul û keder bi wî re mabûn, lê ya bêtir ew kuldar û mereqdarê evîn û evîndariyê bû, wî digot :

Ezê her li dermanê dilê xwe bigerim.

Wî hêrsên evîna xwe di stranên xwe de eşkere dikirin ... Di stranên xwe de eşqa dilê xwe

difûrand û dilê xwe hêdî dikir. Hunermendê hêja pir caran bi stranan şerê felek û xemê kiriye, û bi taybet di strana (Xemê zalim..) û (Nayle Canê) de.

Strana xemê zalim

Lê xemê zalim zalim ... zalim zalim
Lê lê rebenê ji derdê te re bi ro bi şev ez dinalim
Tema te bi qelemê devê xww digot lawiko
Li xerîb û xurbetê li kuştin û mandinê
Tim û tim bi tera ez heval im
Rokê li orta gundê me yê fesad û qums
Gul barîn û di wê demê de ez ne li mal im
Lê lê xemê qehir û şewatê ez kal kirim
Ne ji sala xema min ne ji sala
Rokê seba xatirê êrîşa Kurmanciyê
Sîng û pêsîra derzîya û sepeta ubêdîya
Nava zirav cih û merkeza kilît û kembera newqa hemêliya.
Min berê xwe fitiland herba gawirê Kormisquf
Kela Tûne navbera heft dîwara
Bi ser min de dibû xum xuma tupa û dalisqa
Û ew hisret û kulên giranê bi min re wê serî xwa bidin
diyarê rehimetê kêla kevirî yan kêleka xwa bidin
kendalê axê
Rokê li yêteka Çayê Kurmênic seba xatirê
Eşq û meraqê xwe û xelkê nazik û kîbar
Negeranid govendek keçan û bûkan
Bi heft defan bi heft gopalan ay dilo dil xemê zalim
Lê xemê.. lê lê xemê zalim zalim
Ça li çîyan dinhirin dibêjin em gî çan e
Golîkê li ber makan serê sibê di ber singan de
Tajanan didin xwe û di'urin ew jî dibêjin em gan e
Sa û satorên nav malan
Di nav zincîrên keçan û bûkan de rudinin
Sîngê xwe dikutin simêlan badidin
Ew jî dibêjin em peyan e
Çi bikim îro ferza li sineta badane
Kêr tuj e koşt xelas kir xwe berda ser hestîyan e
Birîna min kûr xedar û yaman e

ay dila dil xemê zalim..
 Lê xemê ça li ça dilolandin..
 lê xemê dilorandin
 Di çelê Zivistanê de li meha zemherîrê
 Berkulên berfa kubêsê li pozê Zozan û Serhedê
 Li benda Bîngolê xemilandin
 Lê lê xemê xemilandin
 Şivana di êvara xudê de kulav li sîngê xwe gerandin
 Pezê bavê xwe kişkirin li dû xwe kişandin
 Li çewlîka deşta Sirûcê li navbera Elîgorê
 Li gundê Şeşê û Metînê li çîçekên sor û sipî
 Digerandin
 Tu we re li halê xelkê nazikî meqibûl.
 Şeva li meqamê nivê şevê
 Xew li teqilên çavê reş û belek herimandin
 Ey lê bexê li ber dêkan wergerandin
 Dewê bavê xwe kilandin
 Li ber stêra kewran qiranê zendê xwe vemalandin
 Dawa xwe li nava xwe gerandin
 Karê xwe kirin xelas kirin
 Sekinîn li ber darê bedenyînesê
 Teqlê çavên reş û belek bi qelemê kila sibhanê
 Di bera kişandin
 Qeter û merhebê guliyê mor
 Di qulpên giharên heyîderî re derbas kirin
 Li ser gurmikên piyan dan ber devê şê û meqesê
 Serê biskan û guliyên diçerpandin
 Êy lê xemê lê.... Lê lê zalim
 Xelkê minî nazik û meqbûl û şêrîn
 Dirêj bû ez î kin bûm pêra negiştim
 Min destê xa li qeter û merhebê guliyên mor gerandin
 Yawaş yawaş hêdî hêdî bi ser xuda min dagişandin
 Min devê xwe lêxisit li xamxama gewriyê
 Li qirka bi çîn
 Ey gelî birano min diranên xwa li hebhenarê ruya
 dagirtin û şidandin
 Goşt xilasbû li ser hestiyê sipî sekinandin
 Tu were li halê xelkê minî nazik meqbul î şêrîn
 Sî û sê bişkuvên Entabê û şamê filitandin
 Erê gelî birano..
 Hêstirên çavan tev xûna sor û rengîn

Erê gelî birano.
 Nav bera pêşîra derziya
 Fena çiçeka Biharê soresipî xemilandin
 Birînên min kûr, xedar û yaman in
 Xelkê minî nazik î meqbul birînên min ji min re
 Îlac kirin derman kirin û kewandin
 Ay dilo dil ...
 Xemê zalim zalim zalim
 Ey lê Xemê zalim zalim
 Lê lê rebenê bi ro bi şev ji derdê te re
 Dişewitim ez dinalim
 Xema min ez dinalim
 Xemê digot lawo hev Bihar e xweş Bihar e
 Hîn hukmê se'd û si'ûdê heye
 Ez bi qurbano dunya sar e
 Xanîyê mala bavê min ubeyê xelikê
 Qey ne kela Mêrdînê ye ez bi qurbano
 Cî û merkeza Tayîrbegê Lawîn û Lewend Paşa ye
 Qey ne bi sera polat e binê zinar e xaniyê mala
 bavê min ubeya xelkê kerpîç e ji axê ye
 Temen û esasê xwe kevirê hewar e
 Deriyê mala bavê min rebena xelkê
 Dar xefîf û dar çinar e
 Seyara xwe dar henar e
 Ji gûna Elî yê selam de maye
 Ez bi qurbano roja îro kurman xwariye
 Ew kirî ardik û dar e
 Tu were panekê lêxe
 Bi dîwêr ve wîne xare
 Ji êvara mîrê mezin de derbaske
 Çiyê bavê minî kal kukumê bêçar e
 Serê min ubeyê bi qurbano
 Derbazke çiyê diya mina cehezkar e
 Serê min rebenê bi qurbano
 Tu were xwe bavê hemêza bol û fere
 Mîna Hema Humsê li hidûdê
 Urdinê û Sûriyê de ez bi qurban
 Di bin re germ e lawo bi qurbano
 Di sere sar e.
 Ay dilo dil.. ay dilo dil
 Xemê zalim.. zalim.. zalim

Hunermendê hêja Cemîl Horo dema di stranên xwe yên evînê de pesna yara xwe dide mirov bîrve diçe.. Yê guhdarî wî dike wek serxoşan dibe. Dema mirov stranên Cemîl Horo baş guhdar dike ew baş dinase ku ew stran di çi demê de hatine amedekirin, û mirovê binase ku di dema Cemîl Horo de xort û keçan çawa ji hev hez dikirin.

Belê.. Cemîl Horo di dema xwe de wek qubleta aşiq û evîndaran bû, hemû xort û keçên Efrînê guhdarî stranên wî dikirin, û ta îro jî stranên wî guhdar dikin , ji ber reseniya evînedariyê di stranên wî de wek dara zeytûnê ye ti berên din nagre, yanê wek çawa zeytûn zeytûn e, di stranên Cemîl Horo de jî evîn evîn e.

Cemîl Horo û Kurdperwerî:

Di sala 1961 an de şoreşa Êlûnê li Kurdistana başûr bi serokatiya Mile Mistefayê Berzanî dest pê kir, kesên ku bi Cemîl Horo re jiyane diyar dikin, ku wê şoreşê bandoreke pir mezin li jiyana wî kir.

Dema mirov stranên wî yên wê demê guhdar dike fîrka bandoriya wê şoreşê baş dibîne. Wî di wê

demê de gelek stran ji bo şoreşê, û ji bo serokê şoreşê strane, wek nimûne : Strana Bavê Kal û Îsa Siwar, û strana Lo Welato û w.d.

Di destpêka sala 1964an de ew dibe endamê Partiya Dimuqrata Kurd li Sûryê, ji bo wê sedemê tê girtin û demekê di zindanê de dimîne. Dema ew li ser girtin û zindanê daxivî ew pir dêşî, lê baweriya wî bi viyanê bilind bû.

Hunermend Cemîl Horo ji bo perçbûnên tevgera Kurdî her nerazîbûna xwe dida xûyankirin, wî pir caran digot tirsê min ew e, ku ez bimrin û yekîtiya tevgera Kurdî nabînim.

Hunermendê hêja Cemîl Horo keçeke wî ya tenê hebû nave wê Mizgîn bû, wî di gelek stranên xwe de gotiye :

“Kî mizgîna azadiya welêt bi min de, ezê mizgînê bi wî dim”.

Di ev gotina wî de bilindiya hestên wî yên netewî tîr naskirin, lê mixabin ew çû ser dilovaniya Xwedê û azadiya gel û wlatê xwe nedît.

Dema tevgera Kurdî li Sûryê bû du perçe, perçek bi çep hate binavkirin, û perçê din jî bi rast hate binavkirin wî nerazîbûna

xwe daye xûyankirin û weha
gotiye :

**Rast û çep çî ye
Şerim û fedî ye
Bi hev re bigrin
Ji me re xêr e**

Di salên şêstî de dema rêjîma
Sûrî welatparêzên Kurdan
dişopandin ji bo wan têxine
zîndanên, hunarmendê hêja Cemîl
Horo ji bo wê yekê stran gotin,
yek ji wan stranan ev e :

**Dora Çayî Kurmênc bi yayîle û zozan e
Sera bi mij e lo kekê bin re bi dûman e
Lê diçêrin kerîk xezal e
Awçiyên kirî guman e
Li pê rêça xezlan tajî û buçî berdane
Li ser rêka xezalan kemen û feq vedane
Dora Çayî Kurmênc bi dar û merx e
Hev dunya faniye kekê dewran û çerx e
Xezal girtin bi kemendê
Heval girtin bi kemendê
Li şûnê maye berx e
Lo hevalino rabin ser xwe
Lo birano rabin ser xwe
Xezalan ji hebsê derxin
Hevalan ji hebsê derxin.**

**Ax û kevirên welatê min ê şewitî,
Ez ji we dût im!!**

(Ez vê pexşanê, diyarî giyanê rêberê nemir mamoste Ismaîl Umer dikim, ...)

Rêberê Silfvî

Li dûriyê,
Li derbederiyê,
Li welatê mij û moranê,
Bi xurtî dilê min ê lertzok hildavêje.
Weke dînan,
weke hovan,
bê hiş û bê armanc li kolanan digirim,
Li çî digirim, bi kû ve diçim û çawa vedigerime lûsa xwe,
Ez nizanîm!.

Bi vê rakirinê, bi vê hilqetandinê,
Agirekî malmîrate ketiye dilê min,
Cerg û hinavan li min diqijilîne.
Hemî berfa van welatên sar,
Ava hemî çem, rûbar û deryan,
Hemî qeşaya ku bi sesdsalan li ser hev kom bûye,
Nikarin agirê dilê min vemirînin,
Nikarin tîna dilê min hênîk bikin û êş û şewata wî sivik bikin!.

Yek caran, pirê caran ez bi tenê dimînim,
Li xwe hay dibim ku ji mêj ve ez bi tenê me!
lê haya min ji min tune ye.
Mijûl dibim, rewan difire,
ji laş dût dikeve,

Gewdê min ê pepûkî bê bask û per li vir dimîne,
dil û hişê min li welatê talankirî,
welatê wêrankirî, bi hev re,
Seyran û gezmaxê dikin!!.

Dikim nakim, axa welatê xwe ji bîr nakim!!.
Dikim nakim,
toz, sergo, kozik, û ariya tenûrên xobanên gundên xwe ji bîr nakim,
Dikim nakim,
zarotî, bender û bîranînên xwe ji bîr nakim,
Dikim nakim,
hebûna xwe ya windayî ji bîr nakim !!.

Li biyaniyê, li welatê xerîbiyê,
Rojê, bi sedan mirov pêrgî min dibin, di ber min re diborin,
Ew dilezînin, dilîzin, dipeyivin û dikenin...
Ewqasî ew geş û şa ne, dev li ken in,
Mîna kulîlkên gulîstanan,
Bînxweş û reng spehî ne.
Bi melûlî, bi belengazî,
Bi hêviya dîtina awireke dilovan ji awirên xelkê welatê xwe,
mîna dînan, ziq ez li çavên wan dinerim..!!
Lê, kesek ji wan, agirê dilê min nabîne!,
Haya tu kesî ji min û derdê min ê giran tune ye!!,
Haya tu kesî ji hest û nestên min tune ye.
Ez dikelim, ji hundur ve, mîna pîşo dikizirim,
biçûk dibim û di nav pêlên kelogiriyê de winda dibim!!.
Welatê min,
Tu di nav mijgûlên çavê min de yî!!
Lê, ez ji te dûr im!!

Sê birûskên çêrokî û helbestek

Ebdilmecît Şêxo

(1)

Gundekî di nav herdu pêşîrên lêlûna dêrînî de, xwe li ser enîşkeke zamdar palveda bû, ewî mîna dapîreke qisawetxwar stêrkên ezmên yên wek zerdelên Basotê ji neviyên xwe re dijmartin û bi dengekî nermîn û hêminî ewanan dikirin xewa ne xew. Lê nobetdarekî mîna qantirê Aleman bi pekandina kevirên bin lingên xwe, serê xewa ne xew jî şikaaaand.



(2)

Di şikefta Duderiya min de, zarokek 40 hezar sal nobetdar bû, gava pêriyên bajarê min rasterast ji wî pirsîn; ma tu, me jî nasdikî? Hestiyên nobetdar lerizîn, kenyan, dagrîn û gotin: Çiqas Mîtaniyên we sersiyên xwe li min dikirin û ji min hezdikirin! Lê hûn dikanin ji min re bêjin; rewşa Nefertîtî çawa ye?

(3)

Du şivan simêlbadayî, pezên xwe li ser sîngê çiyayê Lêlunê de diçêrandin, taveke baranê bi zerp lêkir, şivanan pezên xwe bi lez ajotin nava şikefteke nîzîk, şivanekî di wir de pirtûkek çiriyayî, rizyayî ya Cegerxwîn (Kî me ez) dît. Şivanekî ji yê din pirsî; çiyê ev?

Ewî gote hevalê xwe , pir mixabin ,ez jî mîna pir siyasetmedarên me hîn bi kurdî nizanim bixûnim, lê va ye ez wêneya Cegerxwîn li ser pirtûkê dibînim û herweha jî pir baş tête bîra min, ku beriya 40 salî, şagirtên dibistana Efrînê cejna Newrozê di vê şikeftê de bi nehînî pîroz dikirin û dilên hevdu bi hêviyên cejnên meziiiiin geşşş dikirin .

Efrîn. 21.03.2011

Awaza xilxalan

((Bi boneya cejna rojnameya Kurdî
Diyarî ji giyanê nemir
Reşîte Hemo re))

-1-

Gulava hinarokên bedew ,
Ji çavên xwe yên kor re,
min kire derman.

Ew şahiyên te mîna lehiyên serxweş,
bi ser giriyên min de ,dilop ,dilop,
mîna barana buharê,
mîna buharê dilan,
dihatin xwarê.

Lê ez di xewnên xwe de,
mîna zarokê veciniqîm,
dîsan bi kenînên te ,
bi awaza xilxala lingên te
dîsan ez kedî bûm,

û di hembêzeke germik de
mîna dînekî ne dîn
zarokê ne zarok
di xew de çûm

-2-

Li ser wî girî,
li bin wê darê,
li ser wê darê,
li rex wî latî,
li ber gorna pêxember Horî,
me dîsan bi hev re gorana Eyşa Îbê
istra .

-3-

Di bêhinedanekê de te got ; NOŞ !
NOŞ !
Ji bo van mûmên vêketî,
Ji bo van hestiyên lewentekirî,
Yên Reşîtê Hemo
Ji bo van çûkên ber tîşkên rojê de difirin
te dîsan got
NOŞ!
NOŞ !
Lê awaza xilxala lingên te,
hîn di guhên min de,
dilîze .

Efrîn. Avdar,2011

EY WELAT

Merwan Berekat

Ey welatê min
Dema ku min şîrê teregerm
Ji pêşîra dayîka xwe dimêt
Û ez di pêçekê de digriyam
Tîna evîna te
Û pîroziya eşqa te
Di rehên min de jîn diherikandin
Dema ku dayîka min
Ez di dergûşa sîngê xwe de dihejandim
Û bi strana (nenî kurê min nenî) dilorand
Canê min
Bi dilovaniya te dihate pêçandin .
Ey welatê min
Di goristana pakrewanan de
Navê te
Nîşana gorên bênav e
Dema ku baran dibare
Û pîrejîn mûman vêdixînin
Di dilê min de
Kaniyên evîna te diherikin

Zemîn rûgeş dibe
Û ji axa te bîn difûre
Ez bîna xwîna xwe dikim.
Ey welatê min
Dema ku di Biharê de
xunav û pertavên rojê
Sorgulan geş dikin
Rengê bihuştê diyar dikin
Û xemlejiyaneke nû demê mest dike
Hestên min di bihuştê te de dijîn .
Ey welatê min
Dema ku sêwî
Bi rondikên xemgîniyê
Birînên lêvên xwe dikewînin
Dema ku li goristanan
Bûk û keç nêrgizan diçînin
Canê min avdidin
Û şayîka jiyana min vediciniqe .
Ey welatê min

Dema ku ez şagirt bûm
Li dibistana gund bûm
Mamoste tîp dixwendin
Digot : (A)
Min digot : Ax, axa welêt
Digot : (B)
Min digot : Ez Îzolî me
Kurdekî Siwêrekî me
Digot (E)
Min digot : Ez eniya rojê me
Kurdê hêja ..
Ez Efrînî me .
Digot : (k)
Min digot : Ez Kurd im
Mîtan û Horî me
Kurê rojhilat im
Xwedî derya û çem im
Xwedî çiya û deşt im
Ez xwedî xaka pîroz im
Ji Kudistan im .

Ey welatê min
Li çî welatî be
Li kîjan paytextê be
Pêşwaziyek
Mihreçanek
Yan jî ..
Karwanekî pakrewanan birêkeve
Pêlên girûziyên mayînê min dihejînin
Her şaneka min
Sirûda EY REQÎB dixwîne .
Ey welatê min
Dema ku di bin hîzala asîman de
Taverok û xunavebaran
Hev maç dikin
Û kevanê keskesorê
Dêmên siruştê radimûse
Ez di wê de
rengên hêvî û omîdên
Pakrewanên Kurdan dibînim .

Diyarî bo Govara PIRS

Bavê Serbest

Govara min ev e Pirs
Tev bi tîpên hûr û girs

Mijarên wê cihê reng
Govareke bi nav û deng

Ji dîroka me ya kûr
Gotar têne cûr be cûr

Hin çîrok û çîvanok
Bi koraz(1) û metelok

Nêrînên wê xweser in
Ne mîjo(2) çav li der in

Nivîskarên pir delal
Hin ji dostan hin heval

Qab û qewlik xweşik in
Wêneyên wê rindik in

Hêviya min vir û wir
Ji desteya rêvebir

Haydarê vê Pirsê bin
Li gor çerxa demî bin

Temen diçe roj bi roj
Pêre gerdûn dibe doj

Derdan kirim pîr û kal
Hejiya kok û pergal

Omîda min hebe dad
Gelê min bibe azad

Xweşî têkeve welat
Tevaya gel qat bi qat

Mirov tev bibin serdest
Hêvişt(3) go Bavê Serbest

1).Koraz: Têderxistinok.
3).Hêvişt: Lavij, berger..

2). Mîjo: Zorkê ku şîrê jineke din dimije.

Ji gotinên Bapîran

Av:

Av di Golan de dimîne digemire
Av di Golan de nayê xûyakirin
Av şûna nê nagre
Av di dîwêr re hilnakşe
Av dikeve xew lê dijmin na
Av ji dîwêr bilintir nabe
Av nedîtiye xwe pêxwas dike
Av dilop – dilop kêvir qul dike
Av riya xwe dibîne paşê diçe
Av giyanê dide û giyanê destine
Av û avahî duniyayê şên dikin
Ava bê pira mîna meriyê bê kes e
Av di rûyê wî de nemaye
Avê çima deng ji te tê? got: Hevalên min kevir û kuç in.

Agir:

Agir xweş e lê her agirek ne xweş e
Agir berdaye heriyê
Agir vênekeve dû dernetê
Agir gula zivistanê ye
Agir gur dibe herkes firîkê xwe li ber dibrêje

Bav:

Bav dikare neh kuran xwedî ke , neh kur nikarin bavekî xwedîkin
Bav dimre zarok nizanin bav miriye, Dê dimre stuyê wan xwar dibe
Bav ji kur hez dike , lê kur bavê nas nake
Bav kurê xwe nas dike , Dê keça xwe nas dike
Bav netirse, kur şîret nake
Ji bava de kur sêwî namîne, ji dê de sêwî dimîne
Bavê bê qîz, çiyayê bê av e
Bavê lingê xwe hildayî, kurê wî li şûnê daniye
Bavê xwe kuştiye û bi gora wî sûnd dixe

Birûska behîya rewşenbîrê Kurd Selah Berwarî:

Me bi dilekî xemgîn nûçeya mirina maomosteyê hêja kek Selah Berwarî bihîst.

Em tev dizanin ku kek Selah di dirêjîya temenê xwe de, her tiştê xwe dabû doza gelê xwe û ji ber pêkanîna azadî û mafên wî yên netwewî de sirgûn û dûrewar bû.

Kek selah di warên raman û, çand û zimanê Kurdî de pir çalk bû, û berhemên wî yên pir hêja di wî warî de hatine belvkin.

Bêguman jidestana momosteyê gewre Selah Berwarî ziyaneke mezin e di her warên kurdeweriyê de.

Bila serê malbat, heval, hogir û hemî gelê Kurd sax be. Gelê ku mirovê mîna Selah Berwarî daye, kane Selahine din jî ji nav xwe derîne..

Kovara Pirs